Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 482 5- Mijdar - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



Gerîlayên Kurdistanê li çiyayan tekoşînek û xebateke piralî birêvedibin. Ji xebatên eskerî bigire heta huner, tendurustî û gelek xebatên din jî dikin. Xebatên tendurustiyê jî yek ji xebatên sereke yên gêrîla ye. Gerîlaya YJA Starê Silav Newal ku doktoriyê dike, diyar kir ku ew ji ber hevalên xwe derman dike gelek kêfxweş e.

Gerîllaya doktor, Silav Newal

Silav Newal ku bi bandora endamê Konseya Leşkerî ya HPG'ê Nûman Amed tevlî nava refên gerîla bû û doktoriyê dike got, "Dema ku dibînin hevalên birîndar piştî tedawiyê rehet dibe, moralê jê digirim."
Gerîlayên PKK'ê ku bi dehan salan e li dijî dewleta Tirk û hevkarên wê bi rengekî bê navbera têdikoşin, xwe ji her alî ve bi pêş dixin û têkoşîneke piralî dikin.
Ji gerîlayên YJA Starê Silav Newal, bi perwerdeya ku di nava têkoşînê de wergirtî, hewl dide li qada tenduristiyê alîkariyê bide hevrêyên xwe. Gerîla Silav li çiyayên Botanê doktoriyê dike û dibêje, tedawîkirina hevrêyan ji bo wê çavkaniya herî mezin a moralê ye.
Silav Newal li Amedê ji dayik bû. Qala jiyana xwe ya beriya têkoşîna li çiyê kir: "Sala 2010'an tevlî nava refên gerîla bûm. Dema ku biçûk bûm, heval li gund dihatin mala me ya li gund û bi vî rengî min heval didît. Wê wextê gerîla gelekî bala min dikişand.
Bi taybetî fermandarê herêma Amedê hevalê Nûman gelekî bandor li min kir."
Gerîla Silav diyar kir, tevî ku ew zarok jî bû pîvanên milîtanî û partiyê yên fermandar Nûman nîşan dida, her wiha dilsoziya wî ya bi Rêberê Gelê Kurd û partiyê gelekî bandor li wê kiribû.

GERÎLA NÎŞANEYA HERÎ MEZIN A AZADIYÊ YE

Silav ku di emrekî gelekî ciwan de berê xwe da nava refên gerîla, qala bîranînên xwe yên destpê kir: "Dema ku hatim nava refên gerîla, beriya her tiştî şêweyê jiyanê û hevrêtiya gerîla bala min ikşand. Dema ku min dît çek di destê jinê de ye û ji bo azadiyê li çiyê şer dike, ji bo gel têdikoşe, vê yekê gelekî bandor li min kir.
Ji ber ku di nava sîstemê de zehmet e mirov jineke wiha bibîne ku ji bo welatê xwe, rêberê xwe, ji bo gelê xwe şer dike.
Gerîla nasnameyeke nû ye, sîstemeke nû ye, nîşaneya herî mezin a azadiyê ye. Di nava sîstemê de tê gotin, 'gerîla tenê çekê bi kar tîne'. Halbûkî gerîla ji bo her detaya jiyanê bi zanebûn tevdigere. Zanebûn mecbûriyet e; şert û merc vê yekê li ser mirovan ferz dike. Ji ber vê yekê divê gerîla ji her alî ve xwedî tecrûbe be."

BIKARANÎNA ÇEKÊ TÊRA GERÎLA NAKE

Silav Newal anî ziman ku gerîla ji her alî ve xwe bi pêş dixe û weke kedkareke tenduristiyê qala berpirsyariyên xwe kir: "Destpêkê bi fikar nêzî karê tenduristiyê bûm. Min timî ji xwe re digot, 'Di nava vê rêxistinê de ez dikarim hînî her tiştî bibim, lê nikarim hînî karê tenduristiyê bibim'. Lê piştre, sala 2015'an di pêngava Elkê de hin heval li cem me birîndar bûn û kesekî ku karibe di cih de mudaxle bike tine bû.
Ji ber vê yekê me nekarî wan hevrêyên xwe tedawî bikin û şehîd bûn. Vê yekê gelekî bandor li min kir û bi zora min çû. Min wê çaxê fêhm kir ku tenê bikaranîna çekê têra gerîla nake. Divê gerîla li çiyê ji her alî ve xwe kurt bike. Piştre min biryar da ku çi derkeve pêşiya min ez ê hîn bibim. Ji ber rastiya şer, şehadet û birîndarbûnê, ji bo me wate û girîng bû ku ji xwe ji aliyê tenduristiyê ve bi pêş bixîne."

EM NE TENÊ TEDAWIYA FÎZÎKÎ DIKIN

Gerîla Silav got, "Dema ku min rojnivîskên berxwedana Sûrê xwend, min fêhm kir ku ji ber bêtecrûbetiya personelên tenduristiyê, gelek şehadet çêbûne." Gerîla Silav anî ziman, piştî ku rojnivîskên Sûrê xwend, wê biryar da ku ji aliyê karê tenduristiyê ve bi pêş bixîne. Di dewama axaftina xwe de gerîla Silav got, "Piştî ku dibînim hevalên birîndar bi tedawiyê rehet dibin, ev yek gelekî moralê dide min. Dema ku hevrêyên xwe tedawî dikim, welê li min tê ku birînên wan mîna ku birînên min e. Em êşa hevrêyê xwe hîs dikin û bi vî rengî wan tedawî dikin. Tedawiya me ne tenê tedawiya fîzîkî ye. Em ji aliyê ruhî û psîkolojîk ve alîkariyê didin hevrêyên xwe. Û ev yek ji bo min çavkaniya herî mezin a moralê ye. Piştî ku min dest bi doktoriyê kir, gelekî bi moral bûm; ji ber ku min dît ku ne tiştekî mirov jê bitirse. Bi vê berpirsyariyê, ji bo hilanîna tola salên biuhrî têdikoşim."...*ANF*

Sedema mirina masiyan kêmbûna ava Feratê ye?

Wezareta Ziraetê ya Iraqê red kir ku madeyên jehrî xistibin nava avên Iraqê û bûbe sedema mirina masiyan. Wezaretê eşkere kir ku gelek sedem hene, lê sedemên sereke kêmbûna ava çemê Dicle û Firatê ne.
Li parêzgeha Babil a Iraqê çend rojin bi tonan masiyên di nava çemê Firatê de mirin. Dihate îdiakirin ku madeyên jehrî xistine nava çem, lewma masî mirine.
Lê Wezareta Ziraetê ya Iraqê red kir ku madeyên jehrî ketîbe nava rûbar.
Wezareta Ziraetê ya Iraqê li ser mijarê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê sedema mirina masiyan tê vegotin. Tê gotin ku destpêka meha Cotmehê ve, li çend herêmên parêzgeha Diyale ku nêzî Bexda ne, herwiha bajarokên Tacî û Tarmiye yên bakurê paytexta Iraqê Bexda mirina masiyan destpê kiriye. Li gorî daxuyaniyê li van herêman hewzên xwedîkirina masiyan hene. Di serî de zêde li ser rewşê nayê sekinandin û her ku diçe mirina wan zêde dibe. Piştre ji ber zêdebûna rewşê serî li rayedarên peywendîdar didin.
Li gorî daxuyaniya wezaretê, di roja 29'ê Cotmehê de, bajarokê Mûseyeb yê Babilê li hewzekî ya xwedîkirina masiyan de, mirina masiyan destpêkiriye, lê xwediyê wê aliyên peywendîdar dereng agahdar kiriye û bûye sedem ku gelek masî bimirin.
Wezareta Ziraetê yê Iraqê sedemê mirina masiyan, weke zêdebûna hejmara masiyan a di hewzan de, kêmbûna oksîjen, zêdebûna madey emonya û kêmbûna ava rûbar dibîne.
Li gorî daxuyaniya Wezareta Ziraetê ya Iraqê yek ji sedemên sereke ya mirina masiyan kêmbûna ava rûbarên ku hewzên masiyan li ser in.
Yek ji sedemê kêmbûna ava Dicle û Firatê, dewleta Tirkiyê ye ku li ser Iraqê av kêm kiriye. Bi taybet ji aliyê dewleta Tirk ve ava çemê Firatê tê girtin. Ji aliyê Tirkiyê ve qutkirina avê li Iraqê gelek pirsgirêkên zuhabûn, jîngeh û zireatê çêkiriye. Herwiha bûye sedem ku li başûrê Iraqê pirsgirêka ava vexwarinê derkeve û gelek zevî bê av bimînin.

Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 482 5- Mijdar- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

Em mafê xwe yê xweparastinê bi kar tînin

Fermandara QSD'ê Zinarîn Kobanê diyar kir ku Tirkiye bi êrîşên xwe yên li ser herêmên Bakurê Sûriyê hewl dide temenê DAIŞ'ê dirêj bike û da zanîn ku ew di çarçoveya mafê xweparastina rewa de bersiva êrîşan didin. Zinarîn destnîşan kir ku ew bi rayedarên Koalîsyona Navneteweyî re civiyane û ji bo dewriyeyên hevbeş pêk bînin, li hev kirine.*R-5*

GELÊN SÛRIYÊ LI DIJÎ ÊRÎŞAN BÛNE YEK

Dewleta Tirk a dagirker bi hevkariya hêzên navnetewî û herêmî êrîşên xwe yên li ser Bakurê Sûriyê didomîne. Li hember van êrîşan jî gelên Bakurê Sûriyê hevgirtina xwe xurt dikin û jiyana xwe ya demokratîk û wekhev bi pêşde dibin.

DAGIRKERÎ ÊRÎŞÎ JIYANA DEMOKRATÎK DIKE

Welatiyên Bakurê Suriyê yên Kurd, Ereb û Suryan destnîşan kirin ku wan ji bo azadiyê û parastina axa xwe bi hezaran şehîd dane û ew ê li dijî hemû êrîşan axa xwe biparêzin. Welatiyan diyar kirin dewleta Tirk hewl dide destketiyên bakurê Sûriyê û jiyana demokratîk ku hatiye ava kirin têk bibe û dan zanîn ku ew ê destûrê nedin vê yekê û axa xwe neterikînin û biparêzin. *R-5*

HEVGIRTINA XWE XURT BIKIN

Ji aliyê din ve meş û çalakiyên li Bakurê Sûriyê li dijî êrîşkariya dewleta Tirk berdewam dikin. Bi hezaran welatiyên Girê Spî û bajarokê Qenaya yê bi ser Kobanê jî daketin qadan û êrîşkariya dewleta Tirk şermezar kirin. Di meşan de hat xwestin ku gelên Sûriyê li dijî êrîşan hevgirtina xwe xurt bikin. Di meşan de bêdengiya navnetewî ya li dijî qetilkirina Sara ya 6 salî jî hat şermezar kirin. *R-2*

Em ê nehêlin herêmeke din bê dagirkirin û Efrînê jî rizgar bikin

Jinên ciwan ên kantona Efrîn û Şehbayê yên li navçeya Til Rifatê ku beşdarê roja duyemîn a Mîhrîcana Dengvedana Efrînê' bûne, li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê helwest nîşan dan û êrîş şermezar kirin. Ciwanan diyar kirin ku ew ê nehêlin dewleta Tirk a dagirker Girê Spî û Kobanê dagir bike û wê Efrînê jê rizgar bikin. *R-3*

Pêngava derzikirina zarokan dest pê kir

Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê bi hevkariya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) li Reqayê dest bi pêngava pencemîn a derzikirina zarokan kir û wê heta 8`ê Mijdarê dewam bike. Endamê rêveberiya Navenda Tenduristiyê Xalid Ebdullah diyar kir wê pêngava derzikirinê 4 rojan dewam bike û xwest welatî berê xwe bidin navendên derzikirinê. *R-6*

Tirkiye dixwaze temenê DAIŞ'ê dirêj bike

Li Bakurê Sûriyê nerazîbûnên li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk zêde dibin. Siyasetmedarên Bakurê Sûriyê êrîşên Tirkiyê şermezar kirin û diyar kirin ku Tirkiye bi armanca ku aloziya xwe ya hindirîn derbasî derve bike û temenê DAIŞ'ê dirêj bike êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê dike. *R-4*

Nermîn ji bo azadiya jinan dixebite

Jina Ereb Nermîn Muslim li dijî zextên sînordarkirina rol û azadiya jinan derket û ket nava hewldanan ku pêşî li zewaca bi temenê piçûk ya jinan bigire. Nermîn niha li herêma Şehbayê weke Hevseroka Tevgera Ciwanên Ereb yên Demokratîk bi roleke girîng radibe. *R-3*

Koalîsyon û QSD li Dirbêsiyê dewriyeya hevpar kirin

Li ser êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li dijî herêmên Bakurê Sûriyê Koalîsyona Navnetewî û QSD'ê li ser sînorê Rojava û Bakurê Kurdistanê dest bi dewriyeyên hevpar kirin. Dewriyeyên hevbeş li ser sînorê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de li navçeya Dirbêsiyê û Serêkaniyê hatin kirin. *R-2*

Li Kerkûkê 25 çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin

Fermandarê Operasyonên Taybet ên Kerkûkê Maen Seedî duh têkildarî operasyonên li dijî çeteyên DAÎŞ'ê daxuyaniyek da. Seedî diyar kir koalîsyona navnetewî li dijî du nuqteyên çeteyên DAÎŞ'ê êrîşa hewayî pêk anîn û di êrîşê de 25 çeteyên DAÎŞ'ê hatine kuştin, 2 baregehên wan jî hatine rûxandin. *R-2*

Bêdengiya navneteweyî dibe sedema kuştina zarokên me

Çalakî û nerazîbûnên li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê berdewam dikin. Bi hezaran welatiyên kantona Girê Spî li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker meşek girseyî lidarxistin. Di meşê de êrîş hatin şermezar kirin û hat xwestin ku gelên Sûriyê li dijî êrîşan hevgirtina xwe xurt bikin.

Bi hezaran welatiyên kantona Girê Spî li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên li ser kantonên Kobanê û Girê Spî meşek li dar xist. Di meşê de êrîşên dewleta Tirk hatin şermezar kirin û bang li civaka navneteweyî hat kirin ku ji bêdengiya xwe derkevin.
Di çarçoveya helwestên li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên li ser Bakurê Sûriyê de, bi hezaran welatiyên Girê Spî meşek li dar xist. Rayedar û rûspiyên eşîrên herêmê û nûnerên meclis û saziyên sivîl jî beşdarî meşê bûn.
Di meşê de wêneyên zaroka 6 salî Sara Mistefa ya ku ji aliyê dewleta Tirk de hat qetilkirin û pankartên bi nivîsên "Ji dagirkeriya Tirkiyê re na", "Em zarokên paşerojê ne, bihêlin em mezin bibin û me nekujin" û "Bêdengiya navneteweyî kuştina zarokê me rewa dike" hatin rakirin.
Li ser navê eşîrên Ereb Şêx Mihemed El-Mehyûf, li ser navê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ferîd Etî, li ser navê Rêveberiya Xweser a Girê Spî Xelîl Ebdilkerîm û li ser navê Meclisa Zagonsaz a Rêveberiya Sivîl a Tebqayê Hamid El-Ferec axivîn.
Di axaftinan de êrîşên artêşa Tirk li dijî herêmên Bakurê Sûriyê û hedefgirtina welatiyên sivîl, zarok û rojnamevanan bi tundî hatin şermezar kirin. Her wiha bang li welatiyên herêmê hat kirin ku li hemberî dagirkeriya Tirkiyê hevgirtina xwe xurt bikin.
Di çalakiyê de şêxên eşîran û Yekitiya Rewşenbîran daxuyaniyên cuda xwendin û bang li civaka navneteweyî kirin ku destwerdanê li êrîşên Tirkiyê bikin û rê li pêşiya destdirêjî û hovîtiya artêşa Tirk a dagirker bigirin.
Meş bi dirûşmeyên li dijî dagirkeriyê û dilsoziya bi şehîdan û berxwedanê re bi dawî bû.
Di dawiya meşê de gel berê xwe da konê sersaxiyê yê ji bo zaroka 6 salî Sara Mistefa hatiye vegirtin û sersaxî ji malbata wê û pêkhateyên Bakurê Sûriyê re xwestin…*ANHA*

Koalîsyon û QSD li Dirbêsiyê dewriyeya hevpar kirin

Dewriyeyên hevbeş ên koalîsyon û QSD`ê li navçeya Dirbêsiyê û Serêkaniyê yên kantona Hesekê hatin kirin.
Roja 4'ê Mijdarê di saetên sibê de dewriyeyên hevbeş ên Koalîsyona Navneteweyî û QSD`ê li ser sînorê di navbera Rojava û Bakurê Kurdistanê de li navçeya Dirbêsiyê û Serêkaniyê dest pê kir.
Dewriyeyên hevbeş ji erebeyên QSD`ê û erebeyên leşkerî yên koalîsyonê pêk tên. Dewriyeyên hevbeş ji gundên Xenamiyê û Kerbetilî dest pê kir û çend kêliyan li gundê Kerbetilî sekinîn da ku rewşa sînor bişopînin û her wiha rewşa şêniyan jî bibinîn.

Em tu car nahêlin dijmin gav bavêje axa me

Li bajarokê El-Qenaye yê kantona Kobanê bi hezaran pêkhateyên Bakurê Sûriyê kom bûn û bêdengiya navdewletî ya li dijî êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê şermezar kirin.
Li bajarokê El-Qenaye yê kantona Kobanê bi hezaran pêkhateyên Bakurê Sûriyê bi armanca şermezarkirina êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser Bakurê Sûriyê meşek lidar xistin. Meş li bakurê bajarokê El-Qenaya veguherî metingê.
Di metingê de Hevseroka Meclisa Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Eyşe Efendî axivî û destnîşan kir ku, careke din û li beramberî çavên hemû cîhanê dewleta tirk a dagirker hewl dide tola çeteyên DAÎŞ û El-Nusra rabike.
Eyşe diyar kir ku, ew soz didin ku tu carî derfet nedin dagirkeran ku derbasî Kobanê bibin û ji bo vê jî heta dawiyê wê li ber xwe bidin.
Di mîtingê de Endamê Têkiliyên Giştî yê QSD`ê Ezîz Ehmed jî axifî û destnîşan kir ku artêşa tirk a dagirker zaroka bi navê Sara (6) kir hedef û şehîd xist.
Ezîz Ehmed di axaftina xwe de diyar kir ku çeka wan a herî mezin li hember van êrîşan projeya Netewa Demokratîk û biratiya gelan e.

YCR`ê li Lubnanê banga bilindkirina têkoşînê kir

Li Lubnanê Yekîtiya Ciwanên Rojava (YCR) bi daxuyaniyekê banga bilindkirina asta têkoşînê li dijî dagirkeriya tirkiyê kirin û bêdengiya navdewletî li dijî kiryar û hovîtiya dewleta tirk a dagirker û hedefgirtina sivîlan şermezar kirin.
Li Lubnanê YCR`ê bi daxuyaniyekê êrîşên artêşa tirk a dagirker li dijî Bakurê Sûriyê şermezar kirin û banga bilindkirina asta têkoşînê li dijî dagirkeriyê kirin.
Daxuyanî ji aliyê yek ji rêveberên YCR`ê Elî Qamişlo ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku beriya 4 salan li bajarê Kobanê berxwedaniyên bê hempa hatin kirin mînaka wê jî çalakiya şehîd Arîm Mîrkan a ku ji hemû cîhanê re îrade û berxwedaniya jinê li dijî terorê îsbat kir.
YCR`ê li Lubnanê bal kişand li ser berxwedana Kobanê ya li dijî DAIŞ`ê. YCR`ê êrîşên artêşa tirk a dagirker li ser Kobanê û Girê Spî, bêdengiya navdewletî li dijî van êrîşan û koçberkirina gelê herêmê û hedefgirtina sivîlan şermezar kir.
YCR"ê li dijî êrîşên dagirkeriyê bang têkoşînê li hemû kesan kir.

HPG'ê li Geverê li leşkerên Tirk xist

HPG'ê diyar kir, hêzên gerîla roja 3'ê Mijdarê li Geverê li dijî leşkerên Tirk çalakiyek kirine û di encamê de derbên giran li leşkeran xistin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser mijarê ev daxuyanî da:

LI GEVERÊ ÇALAKIYA GERÎLA

"Hêzên me roja 3'ê Mijdarê saet 9'an li dijî artêşa TC a dagirker a li ser Girê Elîşêr ê li navçeya Geverê va Colemêrgê çalakiyek pêk anîn. Derbên giran li çeper û stargehên yekîneyên dijmin hatin xistin. Hejmara leşkerên di çalakiyê de hatin kuştin û birîndar bûn nehate zelalkirin. Artêşa TC a dagirker piştî çalakiyê obus û hawan avêt herêmê.

ÊRÎŞA BI BALAFIRÊN ŞER

Êvara 30'ê Cotmehê, balafirên şer ên artêşa TC a dagirker bombe li herêma Karoxê ya Qendîlê barandin. Di vê bomberdûmana li Herêmên Parastinê yên Medyayê de tiştek bi hêzên me nehatiye."

Li Kerkûkê 25 çeteyên DAÎŞ'ê hatin kuştin

Fermandarê Operasyonên Taybet ên Kerkûkê Mean Seedî ragihand ku li Kerkûkê 25 çeteyên DAÎŞ'ê hatine kuştin.
Fermandarê Operasyonên Taybet ên Kerkûkê Maen Seedî duh têkildarî operasyonên li dijî çeteyên DAÎŞ'ê daxuyaniyek da. Seedî diyar kir koalîsyona navnetewî li dijî du nuqteyên çeteyên DAÎŞ'ê êrîşa hewayî pêk anîn û di êrîşê de 25 çeteyên DAÎŞ'ê hatine kuştin, 2 baregehên wan jî hatine rûxandin.
Seedî got; "Hefteya borî jî li nêzî bajarokê Dubizê ya ser bi Kerkûkê di encama êrîşeke hêzên koalîsyonê de baregeheke çeteyan hedef hatiye girtin û 6 çete hatine kuştin. Di êrîşek din a hewayî de tunelekî DAÎŞ'ê ya 500 metre direj hatiye hedef kirin û 19 çeteyên di tunelê de hatine kuştin."
Fermandar Maen Seedî diyar kir, li herdu baregehên çeteyên DAÎŞ'ê yên hatine rûxandin serçeteyê wan ê amadekariya êrîşan dikir jî hatiye kuştin.

Dengbêjek dengê wî nehatiye bihîstin

Dema deng ji gewriya dengbêj Remezan derdikeve mirov dibêje qey li kêleka dengbêj Şakiro mezin bûye. Dengbêj Remezan bi dengê xwe yê xweş û zîz ji nav kesera dilê xwe diqîre û kilaman dibêje. Lê heta niha deng û navê dengbêj Remezanê Amedî nehatiye bihîstîn.

Dengbêj Remezanê Hênê bûye nebûye bi dengê xwe yê xweş karê stranbêjî û kilambêjiyê dike û cihek nemaye ku lê negeriyaye. Dengbêj Remezan got enstrûman, muzîk û alavên modern çanda wan a dîrokî xelas kiriye û ew hê jî bi çanda popûler-modern re têdikoşin.
Yek ji çanda kevneşopî ya kurdan dengbêjiye. Dengbêj dikarin bi şev û rojan bûyerên bi serê kurdan de qewimîne bêjin û bi klaman êş, azar û hezkirina civakê ragihînin. Yek ji van dengbêjan jî Dengbêj Remezanê Hênê ye û ew di sala 1966'an de li navçeya Hênê ya Amedê hatiye dinê. 21 sal e li navçeya Rezanê ya Amedê dijî.

JI KESERA DILÊ XWE DIQÎRE

Ew aşiqiyê ji malbata di nav de mezin bûye fêr dibe û niha jî wek pîşeyek ji xwe re dike. Beriya çanda estrûmanan derkeve dengbêj Remezan li gund û bajaran diçe dawetan distrê û li def û zirnê dide. Dengbêj Remezan dibêje ku çanda popûler ango estrûmanên modern karê wan xelas kiriye. Dengbêj Remezan ji nav kesera dilê xwe diqîre û bi dengek xweş û zîz klam û stranan dibêje.
Dema destê xwe datine ber guhê xwe û hebên tizbiya xwe bi li pey hev berdide, bi bejn û bala xwe ango cilên Amedî qîr dide klaman hema mirov dixwaze lê guhdar bike. Her çiqas klaman bi şêwaza herêma Amedê ango aşiqî dibêje jî lê bes dengê ji gewriya wî derdikeve qey mirov dibêje dengbêj Remezan li kêleka dengbêj Şakiro mezin bûye. Wisa heta niha klam û stranên belkî qet nehatine bihîstin pê dadikeve û klaman li pey hev rêz dike. Klam û dengê Remezan hêjayî guhdarkirinê û temaşekirinê ye.

KLAMA 'ZÊRÎN' Û 'BEDIRXAN Û HIZNA XANIM

Heta niha deng û navê aşiq Remezan li ser medyayê nehatiye bihîstîn û qet nebûye mijara nûçeyan. Remezan ji ajansa me Mezopotamyayê re qala serpêhatiya hunera xwe kir û bi dengê xwe jiyan dide klamên mîna "Zêrînê" û "Bedirxan û Hizna Xanim" ku heta niha nehatine bihîstin.

ÇANDA MODERN ÇANDA ME XELAS KIR

Dengbêj Remezan diyar kir ku pêşiyê wan bi qasî ku nayê bîra wî ji aliyê Bakûrê Sûriyeyê ve hatine hêla navçeya Hênê ya Amedê û ew bi bîr dixîne ku vê çanda aşiqiyê ji pêşiyên xwe hînbûne û vê çandê ji bav û kalê xwe dewr girtin e. Dengbêj Remezan anî ziman ku berê bi def û zirnê diçûn gundan û kêfa mirovan li berê dianîn û pê debara xwe dikirin. Dengbêj Remezan da zanîn piştî derketina salonên dawetê û enstrûmanan karê wan ê xwedî çandek qedîm ber bi tunebûnê ve çû û bifikirin êdî li dawetên gundan jî tînin li salonên dawetan dikin.

HEYFA MIN LI WAN ROJAN TÊ

Dengbêj Remezan destnîşan kir ku 30-40 sal berê deşt, zozan, çiya, gund û bajar nediman lê digeriyan aşiqiyê dikirin û got: "Em wek koçer û derwêşan li her deverê digeriyan. Me ji her çand û civaka welatê me mînakek ji wan digirt. Her şevê em li cihekê bûn û konê xwe lê vedida. Em her tim seyar bûn. Gerê di her warî de me zane dikirin. Dema ew dem, kar û rojên berê, civaka berê tê bîra min, dilê min diêşe yanî dilê min xera dibe. Dema ew rojên berê û feqîriya dinyayê tê bîra min gelek caran ji hestewar dibim. Niha jî em diwrek xêrnexwaz de dijîn.

KILAMBÊJÎ BÛYE RUHÊ WÎ

Dengbêj Remezan anî ziman ku ev çanda kilambêjiyê xwe di ruhê wî de bicih kiriye û niha ew wek xwedî derketina çanda bapîr û dapîrên xwe li dengbêjî, kilam û stranan derdikeve. Dengbêj Remezan xwest ku civak hin bêtir li çanda xwe ya qedîm a pê mezin bûne xwedî derkeve…*ANHA*

Di Mihrîcana Dengvedana Efrînê de çalakiyên rengîn

Mihrîcana Dengvedana Efrînê li navçeya Til Rifetê hat lidarxistin. Di mihrîcanê de çalakiyên cur be cur hatin pêşandan.
Mihrîcana Dengvedana Efrînê bi dirûşmeya 'Ciwanên şoreşger û gelê nişîtmanperwer serî hildin, Efrîn li benda me ye' ji aliyê Yekitiya Ciwanên Rojava û Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk ve hatiye birêxistinkirin. Çalakî roja 2'yê Mijdarê li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa ya Efrînê dest pê kir û di roja duyemîn de li navçeya Til Rifatê a herêmê Şehbayê berdewam kir.
Di çalakiyê de Endama Meclisa Malbatên Şehîdan a Kantona Efrînê Qedriye Hesen axivî û got: "Em îro di qonaxek hesas re derbas dibin. Siyasetên hemû dewletan li ser ciwanan pêk tên. Divê ciwan ji şerê taybet xwe biparêzin. Efrîn li benda me ye da ku hûn li ber xwe bidin, xwe birêxistin bikin û wê rizgar bikin."
Hevserokê Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk Mihemed Yûsif êrîşên artêşa Tirk a dagirker ên li dijî Girê Spî û Kobanê şermezar kir û got: "Di van rojan de bi armanca dagirkirinê, artêşa Tirk a dagirker Girê Spî û Kobanê topbaran dike. Em ji dagirkeran re dibêjin ku em amade ne bi birayên xwe re li hemû herêmên Sûriyê li dijî êrîşan bisekinin û em yek in û em rê nadin tu kesî xaka me dagir bikin."
Paşê 4 kom ji xwendekarên dibistanan beşdarî pêşbirkek zanistî bûn û di encamê de koma xwendekarên refa 11'an a amadehî ya dibistana Til Rifat bi ser ketin.
Koma Şehîd Birûsk şanoyek bi navê 'Xapandin' pêşkeş kir.
Di dawiyê de Koma Şehîd Agirî ya girêdayî Tevgera Çand û Hunerê ya Efrînê stranên gelêrî û şoreşgerî pêşkeş kirin û xelekên govendê hatin gerandin…*ANHA*

Derhênerê ji başûr li ser Kobanê fîlm çêkir

Derhênerek Kurd yê ji Başûrê Kurdistanê li ser jiyana şoreşa Rojavayê Kurdistan û kesayetên di nava şoreşa Rojava de filmek kişand. Derhênerê Kurd diyar kir ku wî di dema şerê Kobanê de berê xwe da Rojava û bû şahidê berxwedana şervanên Kurd. Derhêner diyarkir ku ya herî balkêş di nava şervanan de mirovatî û dostanî bû. Derhênerê Kurd Beşdar Hejar demek derbazî Rojavayê Kurdistanê dibe û di wê demê de çend roj li gel şehîd Mûsa dimîne. Derhênerê Kurd çîroka xwe ya di dema serdana Rojava û dîtina şehîd Mûsa Qenas de kir fîlm. Navê filmê xwe jî kir 'Mûsa li Kobanê'.
Derhênerê Kurd Beşdar Hejar di sala 2014'an de derbazî bajarê Kobanê bû û şahidiyê ji berxwedana Kobanê re kir. Hejar nêzîkê mehek ji nêzve berxwedana şervanan dît, li ser vê yekê Hejar filmek bi navê 'Musa li Kobanê' dikêşe.
Beşdar Hejar dema ku şoreşa Rojava destpêkirî, ji ragihandinê dîmen û wêneyên berxwedanê dît. Piştî vê biryar da ku berê xwe bide Rojavayê Kurdistanê.
Gelek sedemên wî yên serdana Rojava hebûn, sedemek herî girîng jî dîtina şehîd Mûsa Qenas bû. Hejar beriya ku biçe Rojava, di qenalên televziyonê de wêneyê wêranbûnê yê Kobanê dîtibû. Lê piştî ku bi xwe çû û Kobanê dît cûdatir bû. Bajarê Kobanê bajarek wêranbûyî bû, lê çavê hemû cîhanê li ser bû. Hejar di vê demê de serdana Kobanê kir. Beşdar li ser armanca xwe ya çûyîna Kobanê got; "Armanca min ya serdanê ne tenê dîtina Kobanê û kişandina kurte filmek bû. Dema ku ez gihiştim nava Kobanê, navenda bajêr hatibû rizgar kirin. Heya dema ku min Mûsa dît, min di nava Kobanê de kolan bi kolan wêne û dîmen digirt. Min dixwest ez biçim Kobanê û kolan kolan bigerim. Min dixwest ez biçim Kobanê û Mûsa bibînim. Çîroka Mûsa ji bo min cûdatir bû, min gelek hewl da ez bibînim. Piştî 25 rojan, rojek ez li navenda Çand û Hunerê rûniştîbûm. Ev cihê ez dibêjim hemû wêran bûyî bû, min ji durve Mûsa dît û min ji hevalê xwe re got ev Mûsaye, lê hevalê min got ew ne Mûsa ye. Piştî ku nêzîk bû ew Mûsa bû. Mûsa kesayetek ciwan û bi cilên leşkerî pêçayî bû. Dema ku nêzîk bû ez çûm û min wî ramusand. Min jêre got ez bi qeçexî derbazî Rojava bûme ji bo ku ez te bibînim."
Derhêner Hejar ji bilî Musa balê dikişîne li ser şervanên din û dibêje; "Di dema ku ez li wê derê bûm, min ti ferqek di aliyê fikir û perwerdê de, di navbera şervanên jin û zilam de nedît. Ya ku herî balkêş ji aliyê me û çavdêrên navnetewî ve, beşdariya şervanên YPJ'ê di nava şer de bû. Şerê ku şervanên jin li Kobanê kirî, wêneyek nû bû ji bo cîhanê. Hemû tiştên Kobanê û Rojava balkêş bûn. Ya herî balkêş jiyana hevbeş, mirovatî û dostanî bû. Ev yek dinava şervanan de gelek bi hêz bû. Kobanê weke xwişka Helebce û Şengalê ye. Parastin û berxwedana her 3'ê cihan wek sembola berxwedana Kurd û netewa Kurdane."…*ROJNEWS*

Ronakbîrên Kurd û hebûna wan li Ewropa

Derwêş M. FERHO

Tê zanîn ku li Ewropa bi sedhezaran Kurdistanî hene. Di nav wan de jî bi sedan ronakbîr hene. Li Kurdistan jî têkoşîneke man û nemanê tê kirin. Divê civak û ronakbîr xwedî helwest bin û vê peywîrê paşguh nekin.
Di nava civakên temamiya dinyayê de xuya ye dema ku her du alî kar û peywîra xwe dikin û bi cî tînin serfiraziya pirralî mimkin e. Dema ev her du alî karê xwe dikin siyaset û hêza leşkerî jî hê rehettir qighin qonaxa hedef.
Di vê nivîsê de ezê li ser erk û rola roankbîrên me Kurdistaniyan li Ewropa bêjim.
Ev bû heştê sal ku ronakbîrên Kurdistanî li Ewropa peyda bûne. Di destpêkê de kêmbûn. Lê paş salên 1980 hejmar bilind dibe. Û di van salên dawî de hejmara ronakbîrên Kurdistanî pirr mezin e. Lê dihember vê zêdebûna ronakbîran de xebat û encamê wê xebatê zeîf e.
Çi sedem hene ku ronakbîr di meydanê de weha bêdeng xuya ne? Çima sersariyek peyda bûye û bêdengiyek hakimê rojê ye? Pêdiví heye ku meriv li bersivên vê pirsê ji dervayê xwe bigere? Yan pirsgirêk di kesayetiya ronakbîriya Kurdistanî de li ewropa heye?
Dem dem deng ji ronabîrên Kurdistanî det diket. Li seranserî welatên Ewropa kêm yan têr xebat dihat kirin û civaka me pêkêfxweş dibû. His dikir ku dengê wan di nava civaka Ewropî de di qada reonakbîriye de heye. Pê dihesiyan ku rayedarên Ewropî hesabê hebûna wan dikin.
Yek ji wan mînakan ew e ku di Tebaxa 2006 de bi dehan ronakbîrên Kurdistanî, nivîskar, hunermend û berpirsiyarên saziyan li hev gihan hev û bangeke hevbeş belav kirin.
Bê goman ev ne banga yekemîn bû ne jî ya dawîn bû. Lê ew bang bi çend zimanan hat belavkirin û bala rayedarên Ewropî kişand. Ji ber rayedarên Ewropiyan dît ku di qada ronakbîriyê de rexne û nerazîbûnek li hember tewra wan di hember pirsgirêka Kurdî heye.
Bi navê Kolektîva Ronakbîrên Kurd li Ewropa daxuyaniyek hevbeşî li ser helwesta li hemberê siyasetmedarên Kurd û polîtîka dewletên Ewropî di derbarê pirsgirêka Kurdistanê de rexnê xwe dan zanîn. Ji ber sedema xebata siyasetmedarên Kurdistanî li Ewropa dihat astengkirin, dihatin girtin û bi vî awayî dibûn şirîkê siyaseta dewletên dagirker li Kurdistanê. Wan di daxuyaniya xwe de dan zanîn ku tu bingehekî hiqûqî di vê tevgera wan de nîne. Ew bi taybetî daxwazên dewleta Turkiyê bi cîtînin û ev jî tê wê wateyê ku pê li hiqûqê xwe dikin. Ew hiqûq ku bê navber behsa mafên ramana azad dike. Bang ji tevahiya raya gistî re dihat kirin ku rayedarên wan li gor norm û krîterên navxweyî hereket bikin. Lê tewra rayedarên Ewropî weha ye ku van norm û krîterên li ser esasê tradisyona demokrasiyê hatine pêkanîn di hember Kurdan de jibîr dikin.
Bi daxuyaniyeke di wê demê de pirsgirêka Kurdî çareser bû? Na. Neheqiyên li ser siyasetmedarên Kurdistanî qediyan? Na. Rayedarên Ewropî refên xwe guhertin? Na. Lê bi saya vê daxuyaniyê û sekna ronakbîrên Kurdistanî li hin cî û deman, ronakbîr û siyasetmedarên Ewropî jî dengê xwe bilind kirin. Yek ji wan ciyan jî Bruksel bû. Bi dehan siyasetmedaran li ser vê mijarê pirsên xwe ji hikûmeta Beljîka kir. Bi dehan berpirsiyarên saziyan nerazîbûna xwe bi rêya daxuyaniyan û nameyên taybetî dan zanîn.
Di vê çarçeweyê de peywîrek/daxwazek ji ronakbîrên Kurdistanî heye ku ew bê rawestan û navber tiştê dikeve ser mile wan bikin. Yan na, dîrok ewê wan tewanbar biniviîse.

Pêngava derzikirina zarokan dest pê kir

Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê bi hevkariya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) li Reqayê dest bi pêngava pencemîn a derzikirina zarokan kir û wê heta 8`ê Mijdarê dewam bike. Endamê rêveberiya Navenda Tenduristiyê Xalid Ebdullah diyar kir wê pêngava derzikirinê 4 rojan dewam bike û xwest welatî berê xwe bidin navendên derzikirinê.

Komîteya Tenduristiyê û Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê dest bi derzikirina felca zarokan kir
Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê bi hevkariya Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê (WHO) dest bi pêngava pencemîn a derzikirinê kir û wê heta 8`ê Mijdarê dewam bike.
Pêngava derzikirinê ji 17 tîman li Reqayê û gundên wê pêk tên, tîmeke sabit ji 18 tîman li navendên Seyf El-Dewlê, El-Keramê, El-Xatûniyê, El-Selhebiyê, El-Reşîd û dibistana Temrîd hatine belavkirin.
Di pêngavê de dermanên dilop ên ji yek rojiyê heta pênc saliyê tên dayîn û derzîdayîna felca masûlkeyan ji temenên 3 mehî heta 2 saliyê tên dayîn.
Endamê rêveberiya Navenda Tenduristiyê Xalid Ebdullah wiha got: "wê pêngava derzikirinê 4 rojan dewam bike, divê hemû welatî berê xwe bidin navendên derzikirinê û kartên xwe bi xwe re bibin û zarokên xwe derzi bikin."...*ANHA*

RAMANÊ RÊBERTIYÊ



Hevjiyana Azad -9-

Abdulah Ocalan

Der barê çareseriya mijarê de Îslam jî bi ser neketiye. Berevajî jiyana rahib û rahîbeyan Îslamê jî girîngî bi têrbûna têkiliya cinsî daye û yeqîn kiriye ku wê bi zewaca bi gelek jinan û jinên di statuya cariyeyan de pirsgirêkê çareser bike. Di Îslamê de pêkanîna hareman bi awayekî bi rola kerxaneya taybetîkirî radibe. Ji kerxaneyê cudabûna wê ew e, bi taybetî ji bo hinan e. Bi xwe di navbera herduyan de ti cudahî nîne. Ev pêkanîna cinsiyetparêziya civakî bi roleke diyarker rabûye ku civaka Rojhilat li gorî civaka Rojava paş bikeve. Ji ber ku Xiristiyantiyê cinsiyetparêzî bi gem kir rê li ber modernîteyê vekir, lê ji ber ku Îslamê dilçûna zêde ya cinsiyetparêz teşwîq kir, ji civaka kevin zêdetir paşve ket û kir ku li hemberî civaka modernîteya Rojava têk biçe. Di têkçûna jin û mêrê Rojhilat li hemberî jin û mêrê Rojava de rola cinsiyetparêziya civakî gelekî girîng e. Ji texmînan wêdetir bandora cinsiyetparêziyê li ser pêşketina civakî heye. Civaka Rojhilat û Rojava gelekî ji hev cuda bûn. Di vê de rola cinsiyetparêziya civakî gelek e. Lewma divê mirov baş li ser vê xalê raweste. Têgihiştina Îslamê ya cinsiyetparêziyê, çi di girankirina kolekirina jinê de, çi jî di desthilatdarkirina mêr de, li gorî şaristaniya Rojava rê li ber encamên zêdetir neyênî vekiriye.
Dema ku mirov pratîka hevjiyana azad pêş bixe, hin xusûsên girîng hene ku divê jin û mêr ji alî û bereyê xwe ve hay ji wan hebin. Jina ku şensê wê ji bo hevjiyana azad heye yan jî dixwaze bibe xwedî vî şensî xusûsên berê pêşî divê guh bidiyê û bi cih bîne, mirov dikare wisa rêz bike:
a- Dema ku jin bi mêr re hewl da seksualîteyê parve bike, divê hay ji xwe hebe ev bi tenê tatmînkarî û xwetêrkirineke biyolojîk nîne, divê berê pêşî zanibe ku ev dişibe wê rewşê, mîna ku bi piling re di qefesa wî de razê, bi penceke hêz û desthilatdariyê re rûbirû be. Nexasim rewşa esaretê û birçîbûnê ya piling di qefesê de, dikare bike ku mêr pencên xwe bêhtir bi kujerî bi kar bîne. Divê jin baş pê zanibe kengî bi têkiliya zewacê ya klasîk ket qefesê ew êdî bi hêsanî sax ji wir dernakeve; berdêla vê yan wê bi canê xwe bide yan jî wê bibe mêpilingeke êsîrbûyî. Mêpiling jina bûye mêr temsîl dike, gelekî kirêt û keraxî ye. Têkiliya cinsî ya di navbera mêrê hegemonîk û jina mêroke ya bi temamî teslîmbûyî de di pêkhatina vê kirêtî û rezîliyê de bi rola sereke radibe. Roja mêr jinê ji keçikanî dixin wê rojê serbilind in, di binê vê de tatmîn û têrbûna cinsî (diyardeya biyolojîk) nîne, ji ber ku di vê têkiliyê de têkiliya desthilatdar-kole pêk hatiye mêr serbilind e. Kengî jin ji keçikaniyê tê xistin, ev ji bo wê dibe destpêka koletiyeke bêsînor. Rê li ber hisa efendiyê desthilatdar vedike û ev jî tê wê maneyê ku ji mêraniya xwe piştrast bûye. Paşê ev rêbaz li ser lawikan tê ceribandin. Saziya koletiyê li ser herdu cinsan jî hat pêkanîn. Jin bi qasî mêr li pey têkiliya cinsî naçe û ev jî têkiliya xwe bi saziya koletiyê re heye. Çalakiya têkiliya cinsî ya ku modernîteya kapîtalîst ew bêsînor zêde kiriye, amûrekî koletiyê ye ku bi awayekî herî berfireh li ser cinsê mirov hatiye ferzkirin; bêsînor derfet û îmkan dide desthilatdarî û mêtinkariyê. Gelekî girîng û manedar e ku pirraniya dînan bi guman nêzî vê têkiliyê bûne, ji ber ku kirêt e, mirov dixe, û rê li ber neheqîqetê vedike.

Pêdiviyên Nexweşxaneya Tebqayê tên temamkirin

Hejmareke nû ya textên nexweşan gihiştin Nexweşxaneya El-Wetenî ya Tebqayê.
Rêveberiya nexweşxaneya Tebqa beriya niha ji rêxistinên têkildar hejmarek textên nexweşan xwestibû da ku bi rêk û pêk li nexweşan binêrin. Piştî demeke dirêj 40 textên nexweşan gihiştin nexweşxaneyê û rêveberiyê jî ew li beşên ku pêwîstî pê zêde ye, belav kirin.
Niha textên nexweşan di nexweşxaneyê de 60 in û piraniya wan ji aliyê têkildar bi hekariya Komîteya Tenduristî ya girêdayî Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Tebqayê hatine wergirtin.
Nexweşxaneya El-Wetenî di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de veguherî baregeheke çeteyan û giştî alav û amûrên wê hatin dizîn...*ANHA*

Şandeyeke Şaredariya Mûsilê serdana Şengalê kir

Şandeyeke Şaredariya Mûsilê serdana Şaredariya Gel a ser bi Rêveberiya Xweser a Şengalê kir.
Şandeke Şaredariya Mûsilê serdana Şaredariya Gel a Şengalê kir û ji aliyê Rêveberê Şaredariyê Qehtan Elî û endamên rêveberiyê ve li bajarokê Xanesorê hate pêşwazîkirin. Şande ji Cîgirê Serokê Şaredariya Mûsilê Mihemed Qasim, Rêveberê karê Giştî , komîteya Aborî û komîteya Plandanînê pêk tê.
Cîgirê Serokê Şaredariya Mûsilê Mihemed derbarê serdana şandeyê de wiha got; "Armanca me ji vê serdanê ew e ku em karibin ji bo Şengalê û navçeyên Sinûnê û gundên wê xizmetê bikin. Bi taybet rêyan çêbikin."
Rêveberê Giştî yê Şaredariya Şengalê Qehtan Elî jî got: "Ji bo em karibin karekî hevbeş bidin meşandin emê bi hev re çend civînan li dar bixin. Wê civîn bi gel re ji were çêkirin. Şande wê guhdarî daxwazên gel bike."...
ROJNEWS

Kêmbûna ava çemê Belîx bandoreke neyînî li çandiniyê dike

Kêmbûna asta ava çemê Belîx di van demên dawî de bandorek neyînî li avdana zeviyên çandiniyê û bi taybet hilberînên zivistanê li hinek hereman dike.
Çemê Belîx jêdera debara welatiyên Reqayê ye. Ji ber ku bi hezaran hektar ji zeviyên çandiniyê ji sînorên di navbera Sûriyeû Trikiyê û heta bajarokê Reqa El-Sumrayê av dide.
Çemê Belîx ji gundê Eyn Erûs ê ku bi 3 km dikeve başûrê gundê Til Ebyed diherike. Dirêjahiya wî 110 km û tev li çemê Firatê dibe. Li bajarokê Reqa El-Sumra yê ku dikeve rojhilatê bajarê Reqayê dabeşî du şaxan dibe.
Kêmbûna ava çem di demê niha de û bi hatina zivistanê re dibe sedema gelek astengiyan. Ji ber ku cotkar bi rêya jeneratoran zeviyan bi ava çem av didin.
Têkildarî mijarê serokê Komîteya Çandiniyê Îsa El-Kanif wiha got: "Ji ber rawestandina projeyên avdanê li ser çemê Belîx di encama şer û talankirina DAIŞ'ê de, cotkar neçar man bi xwe projeyên avdanê li ser çem ava bikin. Niha çemê Belîx ji jêderê û heta cihê ku tev li çemê Firatê dibe bi projeyên avdanê û jeneratoran tijî ye. Ji ber wê ava çem kêm dibe û rê nade ku hemî cotkar jê sûd bigirin."
El-Kanif got: "Ji bo derbaskirina vê pirsgirêkê em ê ji bo sererastkirina hilmijên avdanê û projeyên avdanê li herêmê bixebitin da ku her herêmek para xwe ji ava çemê bigire û hevsengiyek çêbibe."...*ANHA*

Nermîn ji bo azadiya jinan dixebite

Jina Ereb Nermîn Muslim li dijî zextên sînordarkirina rol û azadiya jinan derket û ket nava hewldanan ku pêşî li zewaca bi temenê piçûk ya jinan bigire. Nermîn niha li herêma Şehbayê weke Hevseroka Tevgera Ciwanên Ereb yên Demokratîk bi roleke girîng radibe.

Ji ber tecrubeya xwe, niha di nav tevgerê de kar dike
Nermîn Muslim niha di nav refên Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk de ji bo perwerdekirina jinan li ser encamên zewaca biçûk kar dike.
Nermîn Muslim a 22 salî ji bajarê Helebê ye. Nermîn di 14 saliya xwe de bi zilamekî ku 9 salan jê mezintir re hate zewicandin.
Ji ber zîhniyeta mêrdestiyê ya ku rola jinan sînordar dike, Nermîn nikarî xwendina xwe bidomîne.
Di destpêka aloziya Sûriyê ve Nermîn bi armanca kar koçî Lubnanê bû û li wir keçeke wê çêbû. Piştre hevserê wê jiyana wê di nav mal de bi sînor kir û nehişt ji mal derkeve. Lê Nermîn ev jiyan nepejirand û biryar da ku hevserê xwe berde û vegeriya Sûriyê. Ji ber hin sedeman malbata Nermîn koçî gundê Kefernaya li Şehbayê bû. Piştî hefteyekê hatina wan ya li Şehbayê, Nermîn endamên Tevgera Ciwanên Ereb nas kirin û tev li kar bû. Nermîn 6 mehan wek endama tevgerê kar kir. Tevî hevalên xwe yên jin hewl da hejmara endaman li navçeyê zêde bike û jinên ciwan ji zewaca di temenê biçûk de dûr bixe. Ji ber keda Nermîn di nav tevgerê de niha ew wek hevseroka tevgerê kar dike.
Têkildarî mijarê Nermîn wiha got: "Ji ber zîhniyeta mêrdestiyê ku rola jinan bi sînor dike, ez bi temenek biçûk hatim zewicandin. Min gelek êş ji vê zewacê kişand."
Nermîn destnîşan kir ku wê zîhniyeta mêrdestiyê qebûl nekir, ji lewre hevserê xwe berda û vegerî da ku rê li ber zewaca biçûk bigire. Nermîn diyar kir ku wê ji Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk hêz girtiye û karî hemû astengiyan derbas bike.
Di dawiyê de Nermîn wiha got: "Armanca min ji kar û perwerdekirina jinan ew e ku rê li ber zewaca di temenê biçûk de bê girtin."...
ANHA

Em ê li dijî êrîşan bêdeng nemînin

Ciwanên Efrîn û Şehbayê diyar kir ku ew ê nehêlin dewleta Tirk a dagirker kantona Girê Spî û Kobanê dagir bike û wê kantona Efrînê jê rizgar bikin.
Ciwanên kantona Efrîn û Şehbayê yên li navçeya Til Rifatê ku beşdarê roja duyemîn a Mîhrîcana Dengvedana Efrînê' ku ji aliyê Yekitiya Ciwanên Rojava ya Kantona Efrînê û Tevgera Ciwanên Ereb ên Demokratîk ve hatiye organizekirin, bûne, li dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê helwest nîşan dan û êrîş şermezar kirin.
Endama Yekitiya Ciwanên Rojava ya Kantona Efrînê Sîdra Memo destnîşan kir ku ewê li hemberî êrîşên artêşa Tirk a dagirker bê deng nemînin û diyar kir ku wê êrîşên li dijî her du kantonên Girê Spî û Kobanê qebûl nekin.
Sema Osman wiha got: "Em ê rê nedin dagirkeriya Tirk, Girê Spî û Kobanê dagir bike û em ê Efrîn ji wan rizgar bikin. Ji bo rizgariya hemû herêmên dagirkirî em ê tê bikoşin."
Rebîa Mihemed a ji pêkhateya Ereb diyar kir ku Kurd û Ereb yek in û wiha axivî: "Ew nikarin me ji hev cuda bikin. Em ê xaka xwe ji dagirkeriya Tirk rizgar bikin.
Em ê roleke girîng di rizgarkirina Efrînê ji dagirkeran de bilîzin.
Li ser bingeha projeya neteweya demokratîk a ku banga biratiya gelan dike em bûn yek û em ê projeyê biparêzin."
Rebîa êrîşên dagirkeriya Tirk şermezar kirin û diyar ku ev êrîş ne tenê gelê Kurd lê belê hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike hedef...*ANHA*

Jinên kedkar êrîşên dewleta Tirk şermezar kirin

Komîteya Kedkaran a Jinan li kantona Hesekê êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê şermezar kir.
Komîteya Kedkaran ya Jin li kantona Hesekê bi daxuyaniyekê êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê û hedefgirtina sivîlan şermezar kir.
Daxuyanî bi zimanên Kurdî û Erebî hate xwendin.
Di daxuyaniyê de êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê û bi taybet kantona Girê Spî û warê berxwedanê Kobanê hatin şermezarkirin.
Di daxuyaniyê de bang li hemû dewletên cîhanê, saziyên civaka sivîl û rêxistinên mafên mirovan hate kirin ku li dijî êrîşên artêşa Tirk a dagirker li ser herêmên Bakurê Sûriyê bê deng nemînin.
Komîteyê êrîşa artêşa Tirk ya li dijî zaroka bi navê Sara Mistefa (6) şermezar kir û sersaxî ji malbatên hemû şehîdan re xwest.
Daxuyanî bi dirûşmeyên şermezarkirina êrîşên artêşa Tirk a dagirker bi dawî bû.

Astengdarî li pêşiya afrîneriyê nabe kelem

Melek DEMÎRTAŞ

Bi armanca pêşxistina afrîneriya zarokên astengdar di nava civakê de di bin dirûşmeya "Navenda Cîhana Zarokên Astengdar a şaxê bajarê Qamişlo ya girêdayî Desteya Jinan a Herêma Cizîrê Çaremîn pêşangeha salane ya kar û xebatên destan ku 54 zarokên navendê amade kirine li Navenda Çand û Hunera Mihemed Şêxo ser du rojan hate li darxistin.

ARMANC PÊŞXİSTİNA AFRÎNERİYA ZAROKA NE

Girêdayî mijarê Mamosta Navenda Cîhana Zarokan ya astengdaran Leyal Mihemed ser armanc û xebatên astengdaran ev tişt anî ziman: "Astengdariyên laş tu carî li pêşiya pêşketin û afirîneriya mirovan nabin kelem. Ji ber ku di dîrokê de gelek afirîner hene ku astendarê laşbûn, lê bi saya vîn û fikrên xwe civakên xwe gihandin astên bilind. Di navendê de 4 başên zarokên astengdar hene yên tewehid, ker û lal mengolî (Dawin) û zû netêçgihiştin, armanc ji vê pêşengehê ku afr'neriya zarokan pêşbixin û wan ji rewşa derûnî derxînin moral bidin. Ev du mehin mamoste û zarokên astengdar bi coş hazirtiya vê pêşngehê dikin."

HEST Û XEYLAÊN XWE PÊŞKŞÊ KİRİN

Leyla bal kişand ser tablo û hîsên zarokan û wiha got: "Zarok di x,zkirna tabloyan de hîs, hêvî û daxwazên xwe vegotine, ji ber ku kar û xebatên xwe bi baldarî amade kirin. Her wiha di vekirina pêşengehê de zarokên ker û lal dîmeneke govend û şanoyeke der barê kevneşopiya herêmê de pêşkêş kirin. yanî zarokên ku bi kar destan tevlî vê pêşngehê bûn, heman zarok dîlan û şano jî pêşkêş kirin, zarok bi coş û moral tevlî bûn."

ÇAREMÎN PÊŞENGEH E

Leyla Mihemed diyar kir ku ev çare mîn pêşng li dar dikeve û wiha dom kir: "Desteya Jinê li gorî derfetên xwe alîkariya bi navndê re dike, ji ber zarok xwedî qabiliyetekî zengînin. Hind astengî hebûn ji ber rewaş wan ya taybet zêde dem xwar, lê dîsa jî her çar beşên astengdar ku 54 zarokan pêk tên beşdarî vê pêşngehî bûn. Ku ev 4.pêşengeha astengdaran; ku her salê carekê li dardixin û di her pêşngehê de asta zarokan di milê raman û hilbijartina tiştan de pêş dikeve."
Mamoste aleyla Mihemed bi van gotina bi dawî kir: "Hêviyên me hene ku rêxistinên di hundirê Rojava de piştgirtiyê bidin me, ji ber ku Desteya jinê bi tene xwe nikarê alîkariya pêwîste bide, her wiha ji ber ku ev zarokana hewcedariya mene."

Tirkiye dixwaze temenê DAIŞ'ê dirêj bike

Li Bakurê Sûriyê nerazîbûnên li dijî êrîşên agirkeriyê yên dewleta Tirk zêde dibin. Siyasetmedarên Bakurê Sûriyê êrîşên Tirkiyê şermezar kirin û diyar kirin ku Tirkiye bi armanca ku aloziya xwe ya hindirîn derbasî derve bike û temenê DAIŞ'ê dirêj bike êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê dike.

Siyasetmedarên Bakurê Sûriyê diyar kirin ku Tirkiye bi armanca ku aloziya xwe ya hindirîn derbasî derve bike û temenê DAIŞ'ê dirêj bike êrîşî herêmên Bakurê Sûriyê dike.

Nerazîbûna li hemberî êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser herêmên Bakurê Sûriyê û hedefkirina sivîlan her diçe zêde dibe.

Rêveberê Partiya Sûriya Pêşerojê ya Buroya Hesekê Ehmed Esed diyar kir armanca êrîşên Tirkiyê yên li ser Kobanê û Girê Spî ew e ku aramiya herêmê têk bibe û temenê DAIŞ'ê a ku li Dêrazorê nefesa xwe ya dawî dide dirêj bike.

Esed destnîşan kir ku Tirkiyê ji projeya demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ditirse lewra jî êrîş dike. Esed da zanîn ku Tirkiye bi êrîşan hewl dide tevliheviyê di navbera gelên herêmê de derxîne û temenê DAIŞ'ê drêj bike.

Ehmed Esed derbarê civîna çar alî ya ku li Stenbolê hat lidarxistin jî destnîşan kir ku ev civîn ji bo Tirkiyê bi fêde bû û wiha got, "ji ber ku Elmanya û Fransa di mijara penaberan de ditirsin û Tirkiye jî bi rêya koçberan gefê li wan dixwe. Têkiliyên Tirkiyê û Rûsayyê jî xweş in, ji ber Rûsayyê rê da ku Tirkiye Efrînê dagir bike."

Esed Koalîsyona Navdewletî ji êrîşên Tirkiyê yên li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê berpirsyar girt û destnîşan kir ku hebûna DAIŞ'ê li ser tevahî gelê herêmê xeteriyeke mezin e.

Endamê Komîteya Navendî ya Partiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê Fethullah Hiso jî derbarê mijdarê de got: "Ya balkêş e, her ku hêzên leşkerî li dijî DAIŞ'ê operasyon dide destpêkirin, Tirkiyê bi hemû rê û rêbazan hewl dide vê pêngavê asteng bike û wiha got, ji ber ku Tirkiye DAIŞ'ê wekî amûrekê bi kar tîne da ku projeya demokratîk a Bakurê Sûriyê têk bibe. Di heman demê de hewl dide bala cîhanê li ser aloziya hindirîn a Tirkiyê bibe."…*ANHA*

Her ku tirsiyan êrîş kirin

Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî li ser 'Darbeya 4'ê Mijdarê' ya li dijî HDP'ê daxuyanî dan. Buldan, diyar kir ku her roja derbas dibe HDP mezin dibe, hêvî û cesaretê dide û tu carî çavtirsandî nebû. Temellî jî, bang li parlamentoyê kir ku ji bo serbest berdana hevalên wan gav bavêje.

Hevserokên Giştî yên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî, li avahiya Navendî ya Giştî, di 2'yemîn salvegera operasyona li dijî partiya wan a di 4'ê Mijdara 2016'an de pêk hat, civîna çapemeniyê li dar xistin.

Buldan di civînê de dest pêkê axivî û wiha got: "Em di salvegera duyemîn de ne ku li dijî hevserok, partî, hevşaredar û siyasetmedarên sêyemîn partiya herî mezin a li parlamentê operasyon hate kirin. Ku ev partî siyaseta demokratîk dike û dengê 6 milyon mirovî girtiye." Bûldan diyar kir, ev operasyon dewama hewldana darbeyê ya 15'ê Tîrmehê ye û got, "Operasyona ji bo krîminalîzekirina HDP'ê ye. Di heman demê de operasyoneke qesrê ye ku li dijî gel hatiye kirin."

Buldan bi dewamî got, "2'ê Adarê darbe li DEP'ê hate kirin. Yên ku 2'ê Adarê bi destê DGM'ê darbe kirin, 4'ê Mijdarê jî bi heman rengî darbeya qesrê kirin. Em dixwazin bêjin ku ev darbeya qesrê bi fermana AKP'ê hatiye kirin."

YÊN KU JI BO GEL BÛN HÊVÎ, DÎL GIRTIN

Buldan anî ziman, ên ku dîl hatine girtin hevalên wan e ku ji bo gel bûne hêvî û wiha dewam kir: "Bi taybetî Selahaddîn Demîrtaş lîderek bû ku ji bo gelan bûbû hêvî. Bi dîlgirtina wî re xwestin cesareta wî têk bibin. Demîrtaş ku du caran bû namzetê Serokkomariyê, hêviya gelan bû. Ji bo şikandina vê hêviyê, Demîrtal 2 sal in dîl digirin. Fîgen Yuksekdag hêviya berxwedana jinê bû û ji bo vê hêviyê bişikînin Yuksekdag a hê jî dîl digirin."

HER KU TIRSIYAN, ÊRÎŞ KIRIN

Buldan diyar kir, rejîma AKP'ê her ku ji meşa desthilatdariya gelan tirsiya dest bi operasyonên bi vî rengî kir û got, "Yên ku li Roboskî, Gezî û Somayê komkujî kirin li derve ne. Yên ku ji bo gel siyaset kirin, gel parastin û siyaseta demokratîk kirin, ji ber nêrînên xwe girtî ne. Divê ev siyasetmedar tavilê werin berdan."

NAVÊ VÊ REJÎMÊ, FAŞÎZM E

Temellî jî got, "Ev desthilatdarî ji bo tasfiyekirina siyaseta demokratîk hewl dide û zane ku ev yek jî bi tasfiyekirina HDP'ê dibe. Em ê jî destûrê nedin vê yekê. Divê parlamento ji bo serbest berdana hevalên me yên girtî gav bavêje."

Temellî bi dewamî got, "6 hezar hevalên me niha girtî ne. 53 hevşaredarên me hatine girtin, li 96 şaredariyên me qeyûm hatine bicikirin. Divê mirov nav li vê rejîmê bikin. Ev rejîma otorîter, faşîzm e." Temellî diyar kir, yên ku li dora demokrasiyê li hev dicivin wê di demeke kin de bersiva pêwîst bidin vê desthilatdariyê û bang li hemû gelan kir ji bo xwedî li wekîlên xwe, xwedî li îradeya xwe ya siyasî derkevin. Temellî hişyarî da û got, eger pêşî li vê desthilatdariyê neyê girtin wê welat bibe girtîgeheke mezin.

Temellî diyar kir ku parlamentera HDP'ê ya dîlgirtî Leyla Guven divê tavilê were berdan.

Em ê têkoşîn û berxwedanê bidomînin û bi ser kev in

Wekîlên gel ên dîlgirtî diyar kirin ku Darbeya 4'ê Mijdarê nekarî gelê Kurd û siyaseta demokratîk biqedîne û gotin, "serketin wê bi berxwedanê pêk were."

Wekîlên HDP'î yên dîlgirtî bi wesîla salvegera Darbeya 4'ê Mijdarê ji girtîgehan peyam dan.

KRÎZA CIVAKÎ GIRANTIR KIRIN

Parlamenter Bûrcû Çelîk Ozkan diyar kir, politîkayên ku piştî sala 2014'an li dijî tevgera siyasî ya Kurd û gelê Kurd hatin meşandin, krîza aborî, siyasî, çandî û civakî ya li Tirkiyê girantir kir.

Bûrcû Çelîk anî ziman ku divê pêşî li siyaseta demokratîk bê vekirin, dest ji politîkayên ku cih li vê yekê teng dike bê berdan û got, "Em baş in û xwedî moral in. Em ê bi hev re di serdemên azad de bijîn."

EM Ê BI BERXWEDANÊ BI SER BIKEVIN

Hevseroka berê ya HDP'ê Fîgen Yuksekdag îşaret bi têkoşîna du salên dawî ya HDP'ê ya li dijî zext, zordarî, zilm û neheqiyê kir û got, "Yên ku ji wan hebû ku bi zindanan wê me heps bikin, dîtin ku xwe xapandine. Lê belê ji ber ku nizanin dersê ji şaşitiyê xwe derxînin, em ê dîsa hînî wan bikin. Li dijî desthilatdariya ku welêt dirizîne, yekane alternatîf em in. Ti êrîş, girtin û dorpêçkirin wê nikaribe pêşî li meşa HDP'ê bigire."

Yuksekdag got, "Em bi berxwedanê bi ser ketin, em ê dîsa bi ser bikevin."

DARBE LI DIJÎ MIROVAHIYÊ HATIYE KIRIN

Hevşaredara Bajarê Mezin a Amedê Gultan Kişanak diyar kir, 4'ê mijdarê mezintirîn operasyona qirkirina siyasî ya dîroka Tirkiyê bû û got, "Di serî de gelê Kurd, hewldana ji bo çavtirsandina mûxalefetê, siyaseta giştî û jinan bû."

Kişanak got, "Darbeyeke siyasî bû ku li dijî her kes û hêzên ji bo mirovbûnê têdikoşiyan. Ji xwe neqediya. Xwe li gotineke bi tenê jî ranegirtin. Lê belê demê ev yek bi zelalî nîşan da; ne kes li ber kesî digere, ne jî ji paşeroja xwe ya demokratîk, azadîparêz û aştiyane vedigere. Em li hundir; gelê me û hemû hêzên demokrasiyê li ber xwe didin û bi ser dikevin. Îradeya gel li nava çar dîwaran nikare bê girtin û pêşî lê nikare were girtin. Mîna çemekî bi xum xumî diherike."

DÎTIN KU NIKARIN ENCAMÊ BIGIRIN

Parlamenterê berê yê HDP'ê yê Amedê Îdrîs Balûken îşaret bi krîza siyasî, aborî, civakî û hiqûqî ya heyî kir û diyar kir, pêwendiya vê krîzê bi tengavkirina qada siyaseta demokratîk û darbeya 4'ê Mijdarê heye. Balûken got, "Tevî vê yekê ne partiya me tasfiye bûye, ne jî îradeya gelê me kariye bê şikandin."

Balûken ragihand, di nava 2 salên bihurî de hem li hundir hem jî li derve, hêvî, bawerî û biryardariya partiya wan û gel mezin bûye û got, "Şert û merc çi dibin bila bibin, bi hêza ji meşrû û mafdariya xwe werdigirin, em ê xwedî li aştî, demokrasî û îradeya xwe ya azad derkevin. Em careke din sozê didin gelên xwe ku di vê oxirê de em ê têbikoşin."

DEWLET HER DIRIZE

Hevserokê berê yê HDP'ê Selahaddîn Demîrtaş û Parlamenterê berê yê HDP'ê Abdullah Zeydan diyar kirin ku yên bi girtina wan qaşo hewl dan pirsgirêkê careser bikin, di nava du salan de li her cihî pirsgirêk giran kirin û gotin, "Lê em li ser xeta xwe ya demokrasî, azadî û aştiyê ne. Bi serbilindî em têkoşîna xwe didomînin. Darbeya siyasî ya 4'ê Mijdarê ya li dijî HDP'ê hate kirin bi ser neket, wê bi ser nekeve. Li gel zext û zordariyê jî HDP ji doh bêhtir xurt e."

Demîrtaş û Zeydan diyar kirin, zû ya jî dereng pîvanên demokrasî, aştî, edalet û wekheviyê wê li welêt bi cih bibin û gotin, "Dî vê oxirê de em ê bi biryardarî têkoşîna xwe bidomînin."

DIVÊ TECRÎD WERE RAKIRIN

Parlamenterên berê yên HDP'ê Çaglar Demîrel û Selma Irmak dan xuyakirin, operasyona ku weke darbeya desteserkirina îradeya gel 4'ê Mijdara 2016'an dest pê kir, hîn jî dewam dike û got, "Bi rêya operasyonên qirkirina siyasî dixwazin gelê Kurd û gelên Tirkiyê negihêjin hev."

Her du wekîlan di peyama xwe de ev bang kirin: "Rê û rêbaza zext û tepisandinê bi ser neket, welat hîn bêhtir ber bi kendêl ve dehf da.

Ji bo di kendal re wer nebe, divê tavilê ji vê yekê vegerin. Bi qedandina tecrîdkirina Ocalan re divê şert û mercên azadî û ewlekariyê ji bo wî bên amadekirin û veger li pêvajoya danûstandin û çareseriya demokratîk bê kirin."

Irmak û Demîrel bang li jin û ciwanan jî kirin: "Heta ku dest ji berxwedanê neyê berdan, serketin pêkan e. Em ê li ber xwe bidin û bi ser bikevin."

DIVÊ EM YEKÎTIYA XWE XURT BIKIN

Parlamentera HDP'ê ya Mêrdînê Gulser Yildirim jî diyar kir ku di her şert û mercî de ew ê li ber xwe bidin û destpêkê bi wesîleya salvegera 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanê hemû berxwedêr silav kir.

Yildirim li ser darbeya 4'ê Mijdarê ya li ser partiya wan got, ev êrîş hê jî berdewam dikin û ev êrîş parçeyek ji hişmendiya îmha û înkara gelê Kurd e, ku tifaqa faşist a AKP-MHP serkêşiya vê dikin.

Yildirim işaret bi girîngiya yekîtî û tifaqê kir û got, "Divê em yekîtî û tifaqa hem bi gelê xwe, hem jî bi hemû gelên din re xurt bikin. Wê zîhniyeta ku pence ê nîjadperestî û dijminahiya gelan dike, têk bibin. Bi bîr û baweriya ku wê têkoşîna me ya bi rûmet û prensîbên partiya me HDP'ê, bi ser bikeve û jiyana gelan bi ronahiya rojê xweş û geş bibe."

Dewleta Tirk dixwaze Kurdan qir bike

Welatiyên Qamişlo nerazîbûn nîşanî êrîşên dewleta Tirk ya dagirker yên li ser herêmên Bakurê Sûriyê dan û diyar kirin dewleta Tirk hewl dide destketiyên bakurê Sûriyê û jiyana demokratîk ku hatiye ava kirin têk bibe û dan zanîn ku ew ê axa xwe neterikînin û biparêzin.

Welatiyên Qamişlo destnîşan kirin ku Erdogan hewl dide destkeftiyên gelê Kurd yê azadîxwaz têk bibe û destnîşankirin ku ew ê dest ji xaka ku bi xwîna şehîdan hatiye avdan bernedin.

Dewleta Tirk a dagirker êrîşî bajar û deverên Bakurê Sûriyê dike. Dagirkeriya Tirk bi van êrîşan armanc dike ku vîna gelê herêmê bişkîne û destketiyên wan têk bibe.

Welatiyên Qamişlo êrîşên dewleta Tirk şermezar kirin û destnîşan kirin ku armanca êrîşan şikandina vîna gelê herêmê û qirkirine û dan zanîn ku divê gelê Kurd û gelên herêmê li hember van êrîşan yekîtiya xwe avabikin."

DIVÊ KURD BIBIN YEK

Welatiyê bi navê Şêx El-Matar got: "Tirkiye jî berê ve wek dewletek dagirker tê naskirin. Hewl dide dewleta Osmanî li herêmê vegerîne. Ji ber wê êrîşî herêmên ku rêgeza netewa demokratîk û jiyana hevbeş ji xwe kirine bingeh, dike. Dewleta Tirk di êrîşên xwe de ti cudahî naxe navbera jin û zarokan. Mînaka wê zaroka bi navê Sara ku bû qurbana terora dewleta Tirk e. Di heman demê de rojnamevanên ku rastiya şoreşa Rojava vedibêjin dike hedef."

Her wiha El-Matar wiha dewam kir: "Dem hatiye ku Kurd xwe bikin yek, ji ber wê pêwîste ku kongreyek niştîmanî ji bo parastina mafên gelê Kurd ê ku ji bo azadiyê bi hezaran şehîd daye, li dar keve."

CIWAN WÊ AXA XWE BIPARÊZIN

Ciwanê bi navê Berxwedan Umer destnîşan kir ku binpêkirinên dagirkeriya Tirk yên li dijî herêmê sûcên şer in û divê ji aliyê civaka navdewletî û dadgehên navdewletî bên muhesebekirin û wiha got: "Hedefgirtina jin û zarokan sûcên şer in. Tirkiye bi van binpêkirinan careke din isbat dike ku ew dijminê gelan e."

Berxwedan wiha got: "QSD'ê çeteyên DAIŞ'ê ji herêmê qewirandin, wê carek din herêmên Bakurê Sûriyê li hember êrîşên dagirkeriya Tirk biparêze. Em weke ciwan dest ji herêmên xwe bernadin û heta dilopa xwîna xwe ya dawî em ê welatê xwe biparêzin."

DAGIRKRÎ JINAN DIKE HEDEF

Jina bi navê Mizgîn Yûsif jî destnîşan kir ku Erdogan bi taybet jinan dike hedef û got, "ji ber ku baş dizane jinan li Bakurê Sûriyê azadiya xwe bi dest xistine û di civakê de gihaştina astek bilind. Ji lewre Erdogan jî hêza wan jinan ditirse."

Mizgîn bang li hemû dewletên cîhanê û bi taybet Koalîsyona Navdewletî kir ku helwestên xwe li hember van êrîşan nîşan bidin."…*ANHA*

Divê pêkhateyên Sûriyê li dijî êrîşan bibin yek

Ereb û Suryanên Bakurê Suriyê destnîşan kirin ku wan ji bo azadiyê bi hezaran şehîd dane û ew ê hemû êrîşên li dijî xaka xwe têk bibin. Welatiyan bêdengiya navnetewî ya li hember êrîşên Tirkiyê jî şermezar kirin.

Artêşa Tirk a dagirker êrîşên xwe li dijî herêmên bakurê Sûriyê didomîne. Pêkhateyên herêmê êrîşên dewleta Tirk û bêdengiya navdewletî şermezar kirin.

Jina bi navê Emîne El-Ewad a ji pêkhateya Ereb bang li hemû rêxistinên navdewletî û Meclisa Ewlehiyê kir ku dawî li êrîşên Tirkiyê bînin û wiha got: "Ji bo azadî û jiyana bi rûmet me bi hezaran şehîd da û da zanîn ku pêkhateyên herêmê ew ê bi yekîtiyê êrîşan rawestînin.

Emîneyê got, "hemû pêkhateyên herêmê Kurd, Ereb û Suryan xwedî maf in. DewletaTirk bi êrîşan hewl dide tevliheviyê di navbera pêkhateyan de derxîne. Lê ew ê bi sernekeve."

Welatiyê bi navê Intwan Melkî yê ji pêkhateya Suryan jî diyar kir ku êrîşên dagirkeriya Tirk li dijî herêmê, encama projeya Erdogan a Osmanî ye.

Melkî sedema bêdengiya navdewletî li hember êrîşan wiha rave kir: "Hêzên navnetewî çavên xwe li van êrîşan digirin. Em bang li wan dikin ku bi rola xwe ya mirovî û hiqûqî rabin û ji bêdengiya xwe xera bikin."

Welatiyê bi navê Feysal Selac El-Xelîfa jî diyar kir ku divê dewlet û hêzên cîhanî piştgiriyê bidin daxwazên gelên Sûriyê yên azadiyê û wiha got, "Niha Tirkiyê piştî ku hin herêmên Sûriyê dagirkir niha jî bi tifaqa Rûsan diwaze berê êrîşên xwe bide rojhilatê Firatê."El-Xelîfa bang li hemû rêxistinên navdewletî, mafên mirovan û Neteweyên Yekbûyî kir ku dawî li êrîşên dewleta Tirk yên li dijî herêmên Bakurê Sûriyê ku di nav ewlehî û aramiyê de ye bînin...*ANHA*

Em mafê xwe yê xweparastinê bi kar tînin

Fermandara QSD'ê Zinarîn Kobanê diyar kir ku Tirkiye bi êrîşên xwe îspat dike ku ew naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe û hewl dide temenê DAIŞ'ê dirêj bike û diyar kir ku ew di çarçoveya mafê xweparastina rewa de bersiva êrîşan didin. Zinarîn destnîşan kir ku ew bi rayedarên Koalîsyona Navneteweyî re civiyane û ji bo dewriyeyên hevbeş pêk bînin, li hev kirine.

Derbarê êrîşên dawî ên dewleta Tirk a li dijî Kobanê û Girê Spî û civîna di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hêzên Koalîsyona Navneteweyî de, Fermandara QSD'ê Zinarîn Kobanê ji ANHA'yê re axivî.

Zinarîn Kobanê bal kişand li ser civîna wan bi Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ'ê re kir û wiha got: "Piştî ku artêşa Tirk a dagirker li dijî herêmên Kobanê û Girê Spî êrîş pêk anîn, Komîteya Têkiliyên Giştî ya QSD'ê tavilê bi rayedarên Koalîsyona Navneteweyî re civiyan û rêbazên rawestandina van êrîşan bi wan re gotûbêj kirin. Peywendiyên me bi koalîsyonê re girêdayî mijarê hê jî berdewam in."

Zinarîn destnîşan kir ku dewleta Tirk welatiyên sivîl û zarokan û şervanên QSD'ê rasterast di êrîşên xwe de hedef digire û wiha anî ziman: "Dewleta Tirk zaroka bi navê Sara Mistefa rasterast hedef girt û êrîşên li dijî herêmên Bakurê Sûriyê mafê xwe dibîne. Me ji aliyê xwe ve mijar aloztir nekir û me mafê xwe yê bersivdayînê pêk anî."

Zinarîn da zanîn ku hêzên Koalîsyona Navneteweyî li hemberî van êrîşan xemgîn in bi taybet ji ber ku van êrîşan bandoreke neyînî li peywira wan ya li Bakurê Sûriyê kiriye.

Zinarîn diyar kir ku di civîna QSD'ê û Koalîsyona Navneteweyî de koalîsyonê piştrast kir ku divê ev êrîş bêne rawestandin û rayedarên koalîsyonê diyar kir ku wê dewriyeyên hevbeş bi QSD'ê re li ser sînorê di navbera Bakurê Sûriyê û Tirkiyê de bikin.

Zinarîn da zanîn ku armanca sereke ji van dewriyeyên hevbeş ew e ku êrîşên dewleta Tirk rawestînin û wiha dewam kir: "QSD naxwaze mijarê aloztir bike û dijberiya xwe bi dewleta Tirk re zêde bike. Bersiva wan ji van êrîşan re wê di çarçoveya mafê xweparastina rewa de pêk were û ew dixwazin mijaran bê şer careser bikin."

Zinarîn di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku ji ber van êrîşên dawî ên dewleta Tirk li dijî Kobanê û Girê Spî bandoreke neyînî li peywira Koalîsyona Navneteweyî ya şerê li dijî terorê kiriye û wiha anî ziman: "Armanc ji van êrîşên dewleta Tirk ew e ku pêşveçûna QSD'ê dî şerê tunekirina terorê de asteng bike. Tirkiye naxwaze aloziya Sûriyê çareser bibe û dixwaze alîkariyê bi çeteyên DAIŞ'ê re bike."Fermandara QSD'ê Zinarîn Kobanê di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku QSD piştî van êrîşên Tirkiyê neçar ma pêngava xwe ya li dijî DAIŞ'ê demkî rawestîne…*ANHA*

Helwesta Tirkiyeyê Parastina Îranê ye

Burhan ERDEM

Bi vekişîna ji peymana nuklerê ya bi Îranê re, DYAyê hiştibû ku herkes xwe zelal bike. Pêşiyê wan dewletên ku adetî ji Tehranê xwediyê berjewendiyan in, Almanya, Fransa û Brîtanyayê hewl dan ku helwesta Washingtonê nerm bikin. Bazariya wan a bi rêveberiya Trump re bi mehan berdewam kiribû. Dewletên din ên di peymanê de ku vana Rûsya û Çîn bûn, piştgirî dabûn van hewldanan. Lê Amerîkî ji her demê zêdetir bi biryar bûn û digotin na! Wê Îran bihatiba cezakirin û diviyabû bi serekeyî van dewletên han, hemû dewletên bi Îranê re ticaretê dikin, helwesta xwe biguherînin.

Ji vana ya xwediya helwesta herî ji rêzê Tirkiye ye. Helwesta wê li ser du armanca ne. Ya yekemîn li dijî destwerdaneke leşkerî ye. Lewra Îran li hemberî mezinbûna cîhana Ereb li kêleka Tirkiyeyê ye. Siyaseta derve ya Enqerê ji bo Tehranê her gotiye ku ew faktoreke esasî ya îstikrara hereman ye. Lewra bêyî Îranê cîhana Îslamê dikare bikeve bin bandora Erebîstana Siûdî û dûvikên wê. Ji xwe ji dema Osmaniyan ve ye, li hemberî Ereban bêbaweriyek peyda bûye. Bi pêkhatina komara Tirk re jî, Enqereyê her gotiye divê bi Tahranê xwediya têkeliyên baş be.

Ya duwemîn jî, dageriya Kurdistanê ya vê dewletê ye ku ji hertiştî zêdetir, Tirkiyeyê muhtacî danûstendinên baş ên bi cîrana xwe re dike. Ev yek jî xwediya rabirdûyeke sedsalan e, ji bav û kalên wan mîras maye. Ji bo rêveberiya Erdogan a îroj jî tişta heyatî ev e. Di nava van dewletan de mekanîzmeyeke hatiye çêkirin ku weke şêwra ewlekariyê nav lê hatiye kirin. Ji dema şerê yekemîn ê kendavê ve ye, ev mekanîzma ji bo rêlibergirtina Kurdistaneke azad dixebite. Gelekî jî tê zanîn bi Sûriyeyê ve jî girêdayî xwediyên siyasetên cuda ne, lê dîsa gelekî eşkere ye ku ji bo rêlibergirtina xweseriya Rojava, herdu dewletan hêza xwe kirine yek.

Hikumeta Tirk baş dizane ku ewê Îran bi giranbûna ambargoyê re derbeke mezin bixwe. Ji bo zirara vê yekê kêm bike jî, di nava hewldanan de ye. Liberxwedana Enqerê ya demên dawî ya li heberî DYAyê, ji ber vê ye. Ya li pêş çavan ew e ku, Erdogan baş dizane ne tenê şirîka xwe ya li Sûrî ya ji bo astengkirina dekeftineke Kurdan dihewîne, ew herwiha rêveberiya Îranê li hemberî serîrakirina Rojhilatê Kurdistanê jî diparêze.

Ew tirsa ku bi dehan salan e, Komara Tirk dijî, gelekî xuya ye ku dibe rastî. Wê her digot, bêîstikrariya Iraq, Sûrî û Îranê bela serê wê ye. Gotina wê ya her di dev û guhan de, ew bû ku divê yekitiya axa van welatan xirab nebe. Lê çiqwasî êriş bike jî ev tirsa wan dikeve jiyana wan. Niha ew amade ne hertiştê xwe li ser bikin. Ji bo parastina Îranê çi ji destê wan were wê bikin. Wan ji bîrnekiriye ku piştî pêkhatina rêveberiyên kurdan ên li Iraq û Sûrî, wê dor were ser wan jî. Piştî Başûr û Rojava, Rêveberiyên Kurdan ên li Rojhilat û Bakur jî wê bibe rastiya jiyana wan.